# Hilbijartina pêşdibistanê
# Val till förskoleklass – kurmanji

## Ma mecbûriyê ku hemî zarokên şeş salî biçin dibistanê?

Belê. Mecbûriyeta çûna dibistanê ji nîvsala xwendinê ya payîzê de ku zarok hîngê şeş salî be derbas dibe. Ew jî tê wê wateyê ku pola pêşdibistanê mecbûrî ye.

## Ma ez mecbûr im ku dibistana zarokê min lê bixwîne hilbijêrim?

Ji hemî zarokên şeş salî ku li Göteborg dijîn re cîhekî pola şeş saliyan hatiye veqetîn. Lê belê weke serperişt te maf heye ku sê dibistanên ku tu dixwazî zarokê te lê bixwîne hilbijêrî. Ger tu hîç serlêdaneke nivîskî neşêynî dê hîngê di dibistaneke nêzikî mala (teqrîben du kîlometre nêzikî mala ku zarok lê hatî nîvîsîn) we cîh ji zarokê were bê amade kirin.

Dema te pola şeş saliyan hilbijêrî hîngê tu di heman demê de dibistana bingêhîn jî, ya ku zarokê we lê dest bi pola yelemîn bike jî hildibijêrî. Lewra zarokê te hîngê mafê pêşxistina dorê jî distîne.

## Çawa serî lê ?

Tu dikarî bi rêya xizmetguzariya elekronîk an bi rêya dagirtina formekê li ser malpera www.goteborg.se/valjaskola serî li hilbijaritna dibistaneke guncav bidî Ev serlêdan tenê ji bo dibistanên girêdayî şarederiyan derbas dibe. Dema tu bixwazî zarokê te biçe dibistaneke azad hîngê tu serî yekser li wê dibistanê didi. Pêvajoya serlêdana dibistanên azad bi serê xwe ye.

## Divê ez kîngê serî lê bidim?

Tu dikarî serlêdana xwe di navbera 15 yê mijdar û 15 yê çileya paşîn bikî. Pêwîste hemî agahdariyên mecbûrî binivîsî. Her wiha kontrol bike da ku agahdariyên tu ji dibistanê re dişêynî rast in berî ku tu wan dişêynî.

## Dê kîngê ji min re eşkere bibe wê zarokê min dest bi kîjan dibistanê bike?

Ji hefteyê 9 e mîn de rêveberiya dibistanên bigêhîn hemî biryarên pejirandinê dişêyne navnîşanan. Hîngê bi rêya nameyan tu dê bizanî ka zarokê te dest bi kîjan dibistanê dike. Dema ev biryar gihêşte destên we pêwîst e ku hûn dibistanê agahdar bikin da ku zarokê we dê li wê dibistanê dest bi xwendinê bike. An jî girîng e ku hûn dibistanê agahdar bikin ku zarokê we di dibistaneke azad de an jî dibistaneke din ya girêdayî şadereriyekê de cîh wergirtiye û li wê derê dest bi dibistanê dike.

## Ezê ji ku derê alîkarî bistînim?

Tu dikarî bi ofîsa hemwelatiyan ya li taxa te re pêywendîdar bî an jî ji rêveberiya dibistanên bingêhîn re telefonê vekî li ser hejmara 031-365 09 60 an jî nameya elektronîk ji navnîşana grundskola@grundskola.goteborg.se. re bişêynî.